



HÊVI

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:1 Sibat/1981





HÊVÎ

kovara kurdi ya zarokan

Hejmar:1 Sibat/1981

-TEXTISTINÎ-

PEŞGOTIN.....	2
ZIVISTAN LI KURDÎSTANE DIJWAR E.: 3	
GURIYE KEVOKVAN	5
TIŞTEKÎ MIN HEYE TIŞTANOK.....	10
GALEGALA BEQAN	14

Hevalên delal!


Va ye, hejmara yekem ya kovara we derket.

Me navê kovarê dani "HÊVI". Lewra, kovar bo we ye. Ango, bo hêviyên welat; zarokên Kurda ye.

"Hêvi" jî niha pêde jî mehê carekê wê bî we re be. Hêviya me jî dîl û can ewe ku fêda wê bighê we û bibe hevalek jî we re. Daxwazek me jî jî we heye. Eger hûn kovarê bixwinin û pêşniyari, rexne an nivisandinê xwe (çi çirok, helbest an tiştanok û cî jî resim û tiştên her w.d. bin) bo me verêkin, emê gelek kêfxweş bibin. Name û nivisandinên xwe verêkin, em wan dî vir de çap bikin. Bra hevalên we yên din jî jê haydar bin, tiştên ku hûn zanin, fêda wan bra bighê hevalên we yên din jî.

Silav bo we hemiyan û niha bîminin dî xweşiyê de.

HÊVI



ZIVISTAN LI KURDISTANÊ DIJVAR E.

Vaye disa zivistan hat. Her der berf e. Şembelilik jî sivornekên xaniyan dirêj dibin. Bayeki dijwar û sar tê. Dema zivistanê li Kurdistanê xebatên derve nayên kirin. Herkes karê nav malê û heywanên xwe dike. Jî berfê û jî av û çeman riyên gundan tên girtin. Bî mehan gund di bin berfê de dimînin. Dema yek nexweş dikeve, jî bêdermani û jî bêçareyi pirê caran dimre.

Terş û heywanên me, jî dijwari û dirêji ya zivistanê pirê caran dimrin. Nagihên bi harê. Bo vê yekê zivistan jî bo me jî neyarîran yeke.

Çûk û heywanên kovi zivistanê jî birçî
na xwe jî çiya berdîdî deştê û der û do-
ra gundan.

Ez pîrê caran berfa ber deriyê xwe
paqîj dîkîm. Çûk tîn dî wê reşayiyê de datî-
nî. Jî wan re nan hûr dîkîm û davêjîm. Gava
ku diya mîn, mîn dîbine lî mîn hêrs dibe û
dîbêje:

-Keça mîn, nan tune em bixwî tu davêjî
ber çûkan...

Êvaran jî wexta dibe tarî gur û rovi
xwe ber bî gund dîdî. Dibe ûre ûra wan. Ku-
çîkên gund jî bersivên wan dîdî.

Dema xewroşkan tê û em dîçîn cem dapi-
ra xwe. Ew êvaran jî me re xewroşkan dîbêje.



GURIYE KEVOKVAN

Evarê, pişti şivê Zana, Evin , Baran û Hêlin li mala Evin cıviyan. Çûn li dora dapira wê rûniştin û gotin:

-Pirê, jî me re xevroşkan bêje.

Dapira Evin destê xwe di serê wan da, bî wan şa bû û got:

-Başe, ezê jî we re xevroşkekê bêjim. Lê belê dirêje. Ezê işev hîneki bêjim, dawiya wê jî, bra bîmine şevê dîn. Lewra divê hûn ne min heta nivê şevê, zû razên.

Hemîyan bî hevra gotin:

-Başe, de heydê dest pê bike.

-Xevroşka ez işev bêjim, a mamosteki Îrani; Samed Behrengi ye. Ewi gelek jî zarokan hez



dikir û bo wan xevroşk dînîvisand.
 Lê Şahê Iran'ê wi da kuştin, ne hişt ku bîji.
 A işev ezê xevroşkek wi ji we re bêjim. Dîbê:

—Dî demekê de Guriki bî dapira xwe re dî-
 ji hebû. Dî maleki biçûk wek koxekê de dîji-
 yan. Lî pêrgiya malê bexçeki biçûk, dî navça
 bexçe de ji darek tuyê hebû. Dî binê vê darê
 da bızina Guri ya reş, êmê xwe dîxwar, kayik
 dîani, riya xwe dîhejand, erd dîkola û ji be-
 rêvkê de dîbariya. Oda malê ya lî qîblê dî-
 nihêrt, paceki wê ya biçûki bî kaxez girtî
 lî navça odê tenûrek bo zîfstanê germ bike û

j1 bo dû derkeve û ronahi û hewa bê l1 jor ji rojinek wê hebû. Diwarên odê yêñ sewaxkiri t1-je ref bûn.

Guri, her sibe derdiket çolê stiri û şoluk dıciwand davêt ser mîlê xwe û diani malê. Hinek j1 vana dida bızina xwe, yêñ dın ji l1 ser xani dida ser hev. Ev ji dıbû êmê bızina wi yê zıvıstanê. E j1 ber mayi ji dıfırot.

Guri, pışti nivro ji kevok dıfrand. Çıvıkvaneke çak bû Guruyê me. D1 fikandınê de ji kes d1 ser wi re tunebû.

Dayıka wi ya pir, j1 sıbê heta êvarê l1 ber dolabê hiri dırêsa. Dê û law b1 vi awayi ebûra xwe dıkırın.

Qesra Paşê, l1 hemberi mala wan bû. Qesreki Paşayi pır xweşik hebû. Dılê qıza wi ji ketıbû Gurıyê me. Gava Guri l1 bani kevok dıfırand, qıza paşê ji b1 qewraşên xwe va derdiket eywanê û l1 kevokfırandına Guri mêzedıkır û l1 fikandına wi guhdari dıkır. Carna ji b1 çav û briyan dıxwest j1 Guri re tıştına bêje. Lê belê, Gurıyê me qet xwe b1 wi alı de ne dıkır. Weka ku qet qızıkê ne bine, bala xwe ne dıde wi alı. B1 rasti ewi ji j1 qızıkê pır hız dıkır, lê ne dıxwest qızık pê bıhese. Gelo bo çı? Bo çı çewa, mırov bıciwanda bıciwanda bızınaki wi ya reş, panzde kevokên wi û j1 dêki wi ya pirtır pêştır ma çıyê wi hebû? Qey Paşeki b1 debdebe wê qıza xwe ne dana Guriki wılo bê pere û pıl? Pışti ku bıdanayê ji, wê qıza nazık wê çawa d1 koxek textıki, b1 toz û dûman de bıjiyana? A Gurıyê me wılo dıramiya, lê!

Qıza Paşê pır dıxwest Guri bıde qısekırı-



nê, lê dıkr ne dıkr nıkarıbû. Rojekê dılê mi-
hekê qul quli kırû bı pencerê darda kır, disa
Guri xwe lı wi alı ne kır xwedi. Ewi, dengê
çirke çirka dolaba diya xwe guhdari dıkr, lı
ser bani lı ber koma stıriya dfikand û kevo-
kên xwe dıfırand.

Paşiyâ paşiyê qiza Paşê nexweş ket û ket nav nivîna. Bo ditîna Guri êdî nîkarîbû derkeve eywanê jî.

Paşê, gazi hemî dîktorê bî nav û deng ên welêt kir û xwest ku jî derdê qiza wî re çareki bîvinîn, lê kîrîn ne kîrîn, qizîk rehet ne bû.

Hemî xevroşkvan dî vîra xevroşkê de dibêjî ku:

"Qiza Paşê, derdê xwe yê dîlkoj jî kesî re venekîriye."

Lê ez dibêjî ku:

Qiza Paşê, derdê xwe yê veşartî jî bavê xwe re vekîr, rojekê. Gava Paşê bîhist ku dilê qiza wî ketîye Gurîkî kevokvan, hêrs bû. Qirîya got: "Kesî wekî dîn ne ma qey tu dilê xwe têxîyê. Carek dîn tu navê wî kurê pis bigrî devê xwe, ezê te jî vî bajarî bîqewîrînim. Ezê te bîdîm lawê wezîr, tê gîhiştî!"

Ma wê keçîka reben bigota çî, tu tîştêk jî ne got.

Paşê, rast çû lî ser text rûnişt û gazi wezîr kir.

"Çîqas kevokên vî Gurîyê kevokvan hene,

dîvê îro serê hemîyan bê jêkîrîn. Jî wî Gurîyî re jî bêjî bîra carek dîn dernekeve ser xanî."

Wezîr, jî merîvên xwe yê gîregîr çend şand mala Gurî. Haya Gurî jî tu tîştî nîn bû, disa lî ser xanî qût dia kevokên xwe. Merîvên wezîr êrîşî ser malê kîrîn, yek bî yek kevokan gîrtî û serê wan jê kîrîn.

(dûmahîk heyê)



TIŞTEKÎ MIN HEYE TIŞTANOK

Evarek zıfıstanê sar bû. Lı derva berf dı-
bariya. Zana, Evin, Baran û Hêlin ciranên hev bûn.
Pışti şivê her çar heval lı mala Hêlinê civi.
Lı ber kuçık rûniştın. Kuçıkê mala Hêlinê tı-
je ağır bû. Hım hundır germ dıkır û hım ji ro-
ni dıkır.

Zana got:

- Hevalno, werın em işev tiştanokan bêjin.
Ki nıkarıbe tê derxe ewê wek heywana biore û
bızûre.

Hemıyan, lı ser vê pêşniyariya Zana bı hev-

ra çepik lêxistin û jî devekî:

-Pîr baş, heydê em zû dest pêkî.

Zarokan bî kêf helqe girêdan.Evinê got:

- Pîrskîrîn û bersivdan bîra bî dorê bigere.

Hemîyan bî ser leqanê vê pêşniyariyê jî qebûl kîrîn.Jîmartîn, pişk lî Zana ket.Zana jî

Evinê pîrsî,

- Tu hazîrî Evin?

Evin:

- Belê ez hazîrîm. Fermo, haydê bîpîrse.

Zana:

- Hûr-hûr bari

Hey-hey bari

Deşt û banî

Herçar alî

Girt û danî

Ew çîye?

Evinê qet nepa, dî cî de :

- Waye niha lî derva dîbare.

Zana bersivê dî cîh de ne dit û got:

Ev ne bersive, çî lî derva dîbare?

Evin bî dengêkî bîlînd:

- Berf dîbare, çî dîbare!

Hemîyan bersivê rast ditîn.

Dor hat ser Hêlin û we jî jî Baran pîrsî:

-Hîlîndîr,mîlîndîr,

Law jî bavê bîlîndîr

Ew çîye?

Baran destê xwe da eniya xwe, bîstîkeki sekîni û bersiv da:

-Ew niha jî vê malê derdîkeve der.

Hêlin:

- Çı jı malê derdıkeve der, avê mın dertê?
Bersivê rast bide.

Baran :

-Dû jı malê nıha dertê, dû.

Hemiyan bı hev re bersiva Baran rast ditın.
İcar dor hat ser Evinê û Evin jı Zana pırsi:

- Ew ki ye,

Ku mehê carekê kal dıbe,

Dimre û disa dızê?

Zana gelek ramiya, lê tê dernexıst.

Evin:

-Ezê heta bisti bıjmêrım, ku tu tê dernexi
emê ceza bıdın te.

Evin heta bisti jımart lê Zana tê dernexıst
Evin lı çepıka da û rabû piyan:

- Xelas! xelas! Te tê dernexıst. Heydê wek
dik bang bide.

Hemi kenıyan û bı dengeki gotın:

-Heydê, heydê wek dik bang bide.

Baran bı ken wek dik bang da:

Qi, qırı qi qııı... Qi qırı qi qııı...

Gotın: Heydê Baran icar dora te ye. Tu ji
jı Hêlinê bıpırsê.

Baran:

- Hêlin, tu hazırı. Heydê ez te bıbınım. Tış-
tanoka mın pır zor e.

Hêlin:

- Mın jı nıha ve xwêdan da. De heydê zû bı-
pırsê.

Baran:

- Du xwışkên cınar



Jı hev na kın bawer


Ev çi ye?

Hêlin:

- Mın tê derxıst, çave çav.

Hemıyan bı hevre:

- Her bıji Hêlin, te tê derxıst.



GALEGALA BEQAN

Rojeki jî rojên biharê bû. Zarok, lî Kurdistanê diçûn devê çem û newalan, lî ser qıram û mêrgan dileyıstın.

Beqekê jî, dî çem de, dî nav avê de, bî kêf û dılxeşî avjeni dıkır. Beqeki dın jî lî qeraxê avê lî ser kevır tut dabû. Wê jî xwest ku avjeni bıke. Go şılp xwe virvirand nav avê. Beqa ku berê dî nav avê de avjeni dıkır, jî nıfşkê ve vecınıqı, tırsiya. Paşê jî beqa nûhati pırsi:

-Tu jî ku têyi?

Beqa nûhati, balûlıkên bın guhên xwe werı-
mand û b1 deng bersiv da:

- J1 berrriii...berrriii... berrriii...

Beqa ku berê avjeni dıkr:

- Te ç1 kırrriii?... kırrriii?... kırrriii?..

Beqa nûhati:

- Kavırrrr...kavırrrr...kavırrrr...

Beqa dın:


- Çend rıbbb?... çend rıbbb?... çend rıbbb?

Beqa nûhati:

- Heft rıbbb...heft rıbbb...heft rıbbb...

Beqa ku berê avjeni dıkr:

- Errık!... errık!... errık!...



Geli hevalan

Dı şıklê jor de, Kevok dı hefsê de maye. Dike
na ke, nıkare rê bibine û derkeve der. Gelo
hûn dikarin herin wê derxin û binin ?

H Ê V I :

ADRESS:

Kovara Kurdi ya zarokan
Kurdish children magazine
Kurdiska barn tidning

Hêvi / BOX 5034 16305
Spanga/SWEDEN
Postgiro,439 33 42-3

PRIS:3 kronor / SUBSCRIPTION-ABONE:30 kronor per år